# NUH

Xwedê ye efrandarê her tiştê li ezmanan û li ser erdê. Xwedê li ser dinê mirov di wêneyê xwe de efirand, lê Adem û Hawa li gor peyva Xwedê nekirin, ew man bi serê xwe û wan xirabî kir.



Kî her tiştê li ezmanan û  li ser dinyayê efirand?

..................................................................................................

Çaxê Xwedê dît ku xirabîyên mirov zehf gelek in û nêt û daxwazên herkesî xirabî ye, hêrs ket û got: «Ezê ji ser rûyê dinyayê qira hemû mirov, heywan, teyrên ezmên û her tiştê ku min efirandiye bînim».



Xwedê çi dît ? ....................................................


Li ser dinyayê mirovek hebû, navê wî Nuh bû, ew ji Xwedê ditirsîya û Xwedê jî ji wî hez dikir. Xwedê ji Nuh re got: «Li ber min dawiya hemû mirovan hatiye,  çimkî dinya bi xirabiya wan tije bûye.
Ezê qira hemûyan bînim, lê tu ji bo mala xwe, gemiyeke wek ku ez ji te re bêjim çêke. »



Kî li ser dinyayê ji Xwedê ditirsîya û Xwedê jî ji wî hez dikir?


……………………………………………………………………………………..

Nuh, li gor gotina Xwedê, gemiyek çêkir û ji her heywanan, teyran û rêwiran tevî xwe hildan. Ji heywanên paqij heft heft, û ji yên nepaqij jî cot cot, wek ku Xwedê gotibû, tevî xwe hildan.




Nuh çi çêkir? ...............................................................

Li ser dinyayê çil şev û çil rojan baran barî, tofan rabû. Dinya bû behr. Gemiya Nuh ser avê ket. Av wusa bilind bû ku hemû tişt nixamtin, heta hemû çîyayên bilind jî wusa nixamtin.



Avê çi nixamtin? ..................................................

Piştre Xwedê Nuh û hemûyên ku bi wî re bûn anîn bîra xwe. Xwedê li ser dinê ba rakir û av hin bi hin kêm bû. Gemiya Nuh li ser çiyayê Araretê sekinî.



Gemiya Nuh li ku derê sekinî?

.................................................................................

Piştî çil rojan Nuh ji gemiyê qirek berda, ew çû û nehat. Paşê wî kevok berda, ew çû û şunde hat. Piştî demekî din dîsa kevok berda, ew dîsa vegeriya û pelçimekî dara zeytûnê di nikulê wê de bû.
Nuh fêmkir ku ser dinê erd derketiye.



Nuh kîjan teyrikberda?

..........................................................


Xudan Xwedê ji Nuh re got: «Ji gemiyê derkeve, tu, maliyên te, kurên te û bûkên te, wusa jî ew hemû rewîr, teyr û heywanên ku di gemiyê de ne bila derkevin. Wusa jî hemû şêlînekên ku li ser erdê dişêlin. Ser dinyayê zêde bibin û ber bidin».
Weha Nuh û hemûyên tevî wî ji gemiyê derketin.



Kî û kî tevî Nuh ji gemiyê derketin?

...............................................................................

Nuh gorîgehek çêkir û ji her heywan û teyrên paqij hildan û li ser gorîgehê ji Xwedê re kirin gorî.



Nuh çi çêkir? Çima Nuh gorîgehek çêkir?

.........................................................

Xwedê ji Nuh re got: «Ez di nav xwe û we de û di nav hemû jîndarên tevî we de vê keskesorê datînim. Ev nîşana peymana min ya heta hetayê ye.
Gava ez ser dinê, ewran bînim, bila keskesora min xuyabibe. Hingê ezê peymana xwe bînim bîra xwe, ya ku di nav min û we de û di navbera hemû jîndaran de ye, da ku êdî dinya nebe behr û mirov helak nebin».



Xwedê çi danî ku bibe nîşana peymana wî?
.............................................................